KREIS VIERSEN

Kommunales Integrationszentrum Kreis Viersen



© Monkey Business – stock.adobe.com

Kurdisch

# ZAROKÊN MIN DIÇIN DIBISTANÊ

Ji dêûbavan re şîret dikin ku dest bi dibistanê bikin

Bi zimanên jêrê jî heye:

Erebî, Inglîzî, Farisî, Yûnanî, Îtalyayî, Kurdiya Kurmancî, Polonyayî, Rûmanyayî, Rûsî, Tirkî

# Naverok


Destpêk ........ 5
Pergala dibistanê li navçeya Nordrhein-Westfalen ........ 6
Şekl û formên cûrbecûr ên dibistana seretayî ........ 7
Dibistanên şevûrojî û derfetên perwerdehiyê li van dibistanan ........ 8
Dibistanên şevûrojî yên 24 saetî (OGS) ........ 8
Dibistan ji saet 8ê B.N heta 1ê P.N ........ 8
Fêrkarî bi Zimanê Zikmakî (HSU) ........ 9
Pêşketina di warê hînbûna ziman û nixandina wî ........ 10
Kombûnek jibo agahdarkirina dêbavan ........ 11
Di riya dibistanê da ........ 12
Roja Deriyên Vekirî li dibistanên Seretayî ........ 14
Navnivîsandin li Dibistanê ........ 15
Hevpeyivîna Têketina bo Dibistanê ........ 15
Ezmûna Tsêketina bo Dibistanê ........ 16
Dabînkirin ........ 18
Navnivîsandina li Dibistanê li ser daxwaza dêbavan ........ 18
Piştgiriya taybet a perwerdehiyê ........ 19
Bersiva erênî/nerênî û OGS ........ 20
Bernameyeke taybet jibo haydarkirina dêbavan li dibistanê dê were lidarxistin ........ 21
Pakêta beşdarî-Perwerdehiyê ........ 22
Riya dibistanê........ 24
Roja vekirina dibistanan ........ 25
Kelûpelên dibisstanê ........ 26
Jiyana rojane li dibistanê ........ 28
Rola dêbavan ........ 30
Navnîşan û riyên têkillî-girtinê ........ 31



# Dêbavên hêja,

Ne tenê jibo zarokê we, belkî jibo we bixwe jî derbasbûna zarok ji heyama Baxçeya Zarokan bo dibistanê beşeke girîng di jiyanê da ye.

Zarokê we hawîrdoreke nû nas dike, hevalên nû ra nasyar dibe û bi vî awayî jibo we jî serdemeke nû ya jiyana rojane dest pê dibe.

Teqez jibo we wek dêbav, ev heyam gengeşeyek e ku gellek pirsan ji we ra pêk tîne.

- Ez çawa dikarim zarokê xwe jibo dewrana dibistanê amade bikim?
- Ez çawa dibistaneke guncan jibo zarokê xwe peyda bikim?
- Gelo zarokê min têra xwe jibo çûyîna bo dibistanê tam amade ye?
- Jibo wergirtina bersiva pirsên xwe dikarim seredana çi kesî bikim?

Jibo ku destpêkirina heyama nû û destpêbûna pola yekem jibo zarokê we bi serketî be, em hin pêşniyaran raberî we dikin.


Ev pêşniyarên li jêrê bersiva pirsên we didin û hin xal û rêkaran jibo piştgiriya ji zarokê we di destpêka heyama dibistanê da raber dikin.

Ez jibo we û zarokê we dem û gaveke xweş heta dema Tomar-kirina Nêv li dibistanê û derbasbûneke serketî bo vê serdema nû hêvî dikim.

Rêveberê navçeyê


Dr. Andreas Coenen

# Pergala dibistanê li navçeya Nordrhein-Westfalen




Dibistana neçarî! hemî zarokên ku – Heta 30ê Îlonê
6 saletiya wan bi dawî tê, di roja
1ê Tebaxa (Agûst) heman salê wek zarokên dibistanê tê zanîn.
(§35 Qanûna Dibistanê – Destpêbûna heyama dibistanê)

## Baldarî!



# Şekl û formên cûrbecûr ên dibistana seretayî



Dibistana seretayî:

- Pêkhatî ji pola 1 heta pola 4.
- Mafê bijartinê navbera:
  - Dibistana seretayî ya civakî
  - Dibistana seretayî ya Itirafî (Incîlî û anjî Katolîk)
  - Dibistana 'PRIMUS' (ji pola 1 heta 10)

- Amadebûnê li dibistanê pirranî bêpere û di eynî demê da neçarî ye.

- Hûn wek dêbav dikarin azad û serbest, bibijêrin ku zarokê we biçe kîjan cûreya dibistanan. Heke dibistanê cihê vala hebe, dê zarokê we bipejirîne.


- Ders bi awayekî normal pêkhatî ji Almanî, Bîrkarî, perwerdehiya giştî, huner, mûzîk, Inglîzî û Livdariyê (Spor) ne.

- Notên (nimreyên dersê) rêziknameyê li Almanyayê bi vî awayî ne:

  1 – Gellek baş
  2 – Baş
  3 – Razîker
  4 – Pêwîst
  5 – Nebaş
  6 – Nebes

ℹ Di du salên destpêkê û di hin babetan da di 3 salên destpêka dibistanê da hîç notek nayê dayînê.

# Dibistanên şevûrojî û derfetên perwerdehiyê li van dibistanan



## Dibistanên şevûrojî yên 24 saetî (OGS)

- Şevan jî zarokê we tê baldarîkirin.
- Bi giştî ji roja Duşemiyê heta Îniyê ji saet 8ê B.N (Beriya Nîvro) heta 4ê P.N (Paş Nîvro), û herîkêm heta saet 3ê P.N.
- Zarokê we di heyama perwerdehiyê da divê heta saet 4 P.N li dibistanê bimîne.
- Heke cihê vala li dibistanê hebe, hûn dikarin navê zarokê xwe tomar bikin.
- Navroj (firawîn) jî raberî zarokê we tê kirin. Jibo navrojê hûn divê ku Alîkariyên Dêbavan raber bikin.
- Eva ku zarokê dikare here dibistana şevûrojî an na, dibistana nseretayî wê yekê ji we ra dibêje.

## Dibistan ji saet 8ê B.N heta 1ê P.N

- Saetên vekirîbûn û misogerkirina baldariyê ji aliyê Dibistanê va: ji saet 8ê B.N heta 1ê P.N
- Zarokê we dikare zûtirkê jî here malê.
- Hûn divê ku Alîkariyên Dêbavan bidin.
- Heke cihê vala li dibistanê hebe, hûn dikarin navê zarokê xwe binivîsînin.



# Fêrkarî bi Zimanê Zikmakî (HSU)



- HSU derfetek jibo wan xwendevanan e ku bi awayekî duzimanî hatine mezinkirin.
- Li navçeya 'Viersen'ê di dem aniha da fêrkariyê bi zimanên Albanyayî, Erebî, Derî, Farisî, Yûnanî, Îtalyayî, Polonyayî, Portekîzî, Rûsî, Spanyayî û Tirkî tê raberkirin.
- Frêkariya şevê li dibistanên cûrbecûr ên navçeya Viersen'ê cih tê.

## Navnivîsandin jibo HSU'yê

- Jibo navnivîsandina zarokê xwe li HSU'yê, divê ku hûn formekê tijî bikin.
- Ev form li dibistana zarokê we li ber destê we ye.
- Li wir divê ku formê jinûve raddestî dibistanê bikin.

  - Navnivîsandin jibo sala niha ya perwerdehiyê heta dawiya meha Adaraê gengaz e.
  - Di tevahiya heyama amadebûna di dibistana seretayî da, dikarin navê zarok binivîsînin, herîkêm heyama navnivîsandinê saleke perwerdehiyê ye.

Forma taybet a navnivîsandina li HSU'yê dikarin ji vê

# Pêşketina di warê hînbûna ziman û nixandina wî

Serdestiya ser zimanê Almanî pêşmerceke pêwîst jibo destpêkirineke serketî li dibistanê ye. Jibo dilniyabûn ji serdestiya pêwîst a zarokê we ser Zimanê Almanî, du rê li ber we hene:

- Derbarê zarokên ku çûne Baxçeya Zarokan: Belgeyên perwerdehiyê

Jibo her zarokekî meyl û meraq û pêşketinên wî/ê di warê hînbûnê da tên tomarkirin. Belgeyên perwerdehiyê yên zarokê we ne û di heyama Baxçeya Zarokan da hevrê digel wî/ê ne.

Hûn dikarin nûtirîn belge û şehediyên perwerdehiyê di civîna hevpeyivînê da jibo navnivîsandina zarokê xwe bînin. Ev belge piştî navnivîsandinê dê rsterast radestî dibistanê bên kirin.

Raberkirina belgeyan bo beşa xizmetên saxlemiyê jibo zarok û nûciwanan her wiha alîkariya dibistanê dikin ku baldariyeke baştir ji zarokan were kirin.

- Derbarê zarokên ku neçûne Baxçeyên Zarokan û anjî çûne Baxçeyên Zarokan, lê dêbavên wan nexwestine ku van belge û şehediyên perwerdehiyê raber bikin: Ezmûna zimên (Delfin 4)

Dêbavên zarokên 4 salî ku di malê da di bin baldariyê da bûne, nameyeke vexwendinê jibo amadebûna di civîna ezmûna zimên da werdigirin. Dê poste nameya vexwendinê jibo we bîne.

Heke zarokê we nekare bi qasê pêwîst bi almanî biaxive, divê heta destpêka dibistanê, biçe Baxçeya Zarokan. Li wir heke pêwîst bike, dê ji perwerdehiyên zêdebarî jî sûdê werbigire.

ℹ Heke hûn wek dêbav zarokê xwe neynin civîna nirxandinê, hûn dê sizaya pere bidin.

# Kombûnek jibo agahdarkirina dêbavan



## Çi kes?

- Ofîsa Rêveberiya Dibistanê.

## Jibo çi kesan?

- Dêbavên, zarokên ku di 2 salên din da divê herin dibistanê. (Zarokên 4 salî)

## Kengê?


- Piştî wergirtina postî ya nameya vexwnedinê ya nivîskî.

## Ji ber çi?

- Haydarkirina dêbavan derbarê:
    - Derfetên civakî heta dema destpêkirina heyama dibistanê
    - Piştevaniya perwerdehiyê li Baxçeyên Zarokan
    - Pêvajoya Tomarkirina Nêv li dibistanê
    - Dibistanên seretayî û bijarde
    - Nirxandina zimanî û alîkariya bo pêşketina zimên
    - Hevkariya berpirsên proseyê

*1 sal beriya Navnivîsandina li Dibistanê*

# Di riya dibistanê da



## *Tebax / Îlon / Cotmeh:*

## Nameya Dêbavan / Nameya bajar an navçeyê

- Ji aliyê Ofîsa Rêveberiya Dibistanê va.
- Roja Navnivîsandina li Dibistanê bigirin û her wiha amaje bi pêvajoya navnivîsandinê bikin.
- Zanyarî derbarê Rojên Deriyên Vekirî li Dibistanên Seretayî.
- Vexwendina dêbavan bo vê rêûrismê salek beriya Navnivîsandina li Dibistanê.



## Rêûrisma Haydarkirinê Jibo dêbavan

Zanyarî li ser:

- Cûreyên dibistanan
- Navnivîsandin li Dibistanê
- Roja Deriyên Vekirî li dibistanên Seretayî
- Roja Pejirandinê (resepsiyon)
- Ezmûna Tsêketina bo Dibistanê
- Derfetên perwerdehî û fêrkariyê
- Beşdariya dêbavan

## *Cotmeh / Mijdar:*

## Roja Deriyên Vekirî li dibistanên Seretayî



- Naskirina dibistan, fêrkar, hawîrdor û jiyana xwendevaniyê.
- Hûn dikarin rojên têkildar li Baxçeya Zarokan, li rojnameya xwecihî, li Înternetê an li nameya Rêveberiya Dibistanê bibînin.
- Nasandina vê yekê ku dibistan çî ye û çi derfetên perwerdehî û fêrkariyê hene.

## Hin xal derbarê bijartina dibistanê



- Mewqî û riya dibistanê
- Daxwaza navnivîsandina li dibistanê rojane an dibistana şevûrojî
- Têgehên terbieytî
- Dîn/mezheb
- Pêşniyar û yekemayetî
- Bijartina hevalan li dibistanê

*Mijdar:*

## Navnivîsandin li Dibistanê



- Tevahiya zarokên ku di sala niha da divê herin dibistanê, divê ku herîpirr heta 15ê Mijdarê navê wan hatibe tomarkirin.
- Hûn dikarin Dema navnivîsandinê an bi riya berpirsê dibistanê bizanin an jî di rojnameya xwecihî an nameya ku ji aliyê ofîsa rêveberê Dibistanê digihêje ber destê we, bibînin.
- Bala xwe bidine ser vê yekê ku Navnivîsandina seretayî li dibistanê bi wateya pejirandina tam û dawî ya zarokê we li dibistanê nîne. Derbarê navnivîsandina dawiyê ya zarokê we li dibistanê, berpirsên dibistanê biryarê didin ku piştî bidwîhatina pêvajoya nirxandinê, encamên dawî radigihînin.

## Hevpeyivîna Têketina bo Dibistanê



- Di civîna navnivîsandinê zarokê xwe jî digel xwe bînin.
- Di vê civînê da tê hilkolandin ku zarokê we çiqas ji hêla fikrî û hizrî va mezin bûye û zimanê Almanî çiqas dizane.

## *Tebax – Tîrmeh:*

# Ezmûna Tsêketina bo Dibistanê

### Kengê?

- Piştî 6emîn salvegera jidayîkbûna zarok.

### Çi kes dikarin hebin?


- Hemî zarokên ku heta dawiya Îlona wê salê 6 saletiya wan bi dawî dibe.

### Şûn?

- Rêveberiya Tendurustiyê ya Navçeya Viersen'ê, Rathausmarkt 3, 41747 Viersen.

### Ji ber çi?

- Jibo hilkolandin ku rewşa tendurustiyê ya zarokê we û eva ku gelo hewcetî bi alîkariyê heye an na.



Ji kerema xwe di vê civînê da babetên jêrê hevrê digel xwe bînin:

- Nameya têkildarî ezmûna Têketina bo Dibistanê
- Pirsnameya tijîkirî (raberkirina lêzanînan dilxswazî ye)
- Pirsnameya zer a zanyariyên zarok
- Karta Petromekirinê
- Heke hene, belgeû şehediyên têkidlarî heyama Baxçeya Zarokan.

# Pêvajoya ezmûna Têketina bo Dibistanê

**Beşa yekem**
**→Perestarê zarok**

- Pîvandina Dîtbarî û Bihîstinê
- Temrînên têkildarî hejmartin, têgehîştina hejmaran, hevahengiya dest û çavan û lêhûrbûnê
- Hilkolandina rewşa Petromekirinê
- Hilkolandina pirsnamey

**Beşa Duyem Bijîşkê zarokan**

- Hilkolandina pisportiyên hereketî yên zarok
- Hilkolandina hevahengiya dest û çavan, her wiha têgihîştina dîtbarî
- Nirxandina şiyanên zimanî û têgihîştinê
- Lênêrîna bedenî

Vekolandina encamên Lênêrînan

# Dabînkirin



- Tenê di rewşa hebûna nexweşiyên xedar zarokê we dikare salekê derengitr li dibistanê were tomarkirin.

- Piştî raberkirina nêrîna karzaniyê ya bijîşk, berpirsên dibistanê di vî warî da biryarê didin.



# Navnivîsandina li Dibistanê li ser daxwaza dêbavan

- Her wiha jibo zarokên ku roja jidayîkbûn awan piştî moleta qanûnî ya navnivîsandinê ye û dêbavan dil heye ku navê wan tomar bikin, jî Ezmûna Têketina bo Dibistanêtê lidarxistin.

- Di destpêkê da zarokê xwe li dibistana ku dixwazin, tomar bikin. Piştî wê civîna hilkolandina rewşa tendurustiya bedenî ya zarok, di navçeya Viersen'ê da pêk tê.

- Biryardana dawî derbarê navnivîsandina dawiyê ya zarokê we li ser ustiyê dibistanê ye.

## Gelo hûn vê dawiyê gihîştine Almanyayê û zarokê we divê ku here dibistanê?

- Ji kerema xwe zarokê xwe li dibistana ku dixwazin tomar bikin. Dibistan zarokê we bo Rêveberiya Tendurustiyê dide nasandin.

- Rêveberiya Tendurustiyê, dema ezmûna têketina bo Dibistanê ji we ra dibêje.

## Piştgiriya taybet a perwerdehiyê

- Heke hûn difikirin ku zarokê we hewcetî bi piştevaniya taybet a terbiyetî û perwerdehiyê heye, ji kerema vê yekê ji Baxçeya Zarokan an cihên din ên perwerdehiyê ku zarokê we nas dikin (wek mînak bijîşkê zarokan) ra bibêjin.

- Hûn dikarin li dibistana ku we dil heye zarokê xwe li wir tomar bikin, daxwazê bidin ku nirxandina li ser hewcetiya an bê hewcetiya zarok bi vê piştevaniya taybet cih bînin (wek mînak bi ezmûna hiş, dîtbarî û bihîstin an lênêrîna bedenî).

- Ev cûreya piştevaniyê him li dibistana seretayî ya asayî û him li dibistana taybetî kesên taybet heye.

## *Bihar:*

## Bersiva erênî/nerênî û OGS



- Berpirsên dibistanê di Biharê da dêbavan haydar dikin ku gelo zarokê wan li dibistana rojane an li dibistana şevûrojî hatiye pejirandin an na.

- Ji babetên bibandor di pejirandinê da meriv dikare amaje bi hebûna xwîşk an birayê zarok li dibistanê, her wiha asta dûrbûn an nêzikbûna dibistan û malê bike.

- Heke bersiva pejirandinê nerênî be, berpirsên dibistanê dê derbarê kiryarên din we haydar bikin.

  - Ji kerema xwe navnivîsandinê di dema xwe da cih bînin!



*Bihar:*



## Bernameyeke taybet jibo haydarkirina dêbavan li dibistanê dê were lidarxistin

- Vê derfetê jibo naskirina fêrkar û hawîrdor û atmosfera dibistanê bi kar bînin.

- Di vê bernameyê da hûn van mijaran nas dikin:
  - Zarokê we bi çi awayî ji piştevaniya taybet sûdê werdigire.
  - Şêwaza xebata dibistanê.

- Hûn dikarin pirsên xwe di vê bernameyê da bipirsin.



## Seredana dibistanê

- Zarok di sala dawiyê ya Baxçeya Zarokan, seredaneke dibistana xwe ya nûp dikin.

  - Roja Ceribandinê di pola yekem da. Zarok jiyana rojane li dibistanê û hevpoliyên xwe yên pêşerojê nas dikin.

# Pakêta beşdarî-Perwerdehiyê



## *"Derfeta beşdariyê dabîn bikin"*

Pêkhatî ji:

- Hartz IV,
- Alîkariya mesrefa meskenê,
- Kemilînera zarok,
- Sûd û serpişkiyên li gorî qanûna têkildarî piştevaniya ji Penaberan
- Alîkariyên dewletê

Gelo herîkêm zarokek we heye?

Hûn dikarin daxwaza wergirtina alîkariyên taybetî zarok û nûciwanan bidin.

## Şêwaza daxwazê

- Kesên ku meaşa Bêkarbûnê ya cûreya II û alîkariyên dewletî werdigirin, bila seredana navenda peydakirina Kar a Viersen'ê bikin

- Wergirên alîkariyên civakî, alîkariya mesrefa mal û meskenê, pakêtên alîkariyên yên kemilînerê zarok
  An kesên ku Qanûna piştevaniya ji penaberan wan digire ber xwe, bila seredana Rêveberiya Navçeya Viersen'ê bikin

  - Form jî li navenda Peydakirina Kar û him jî li Rêveberiya Navçeyê hene.

- Gerrên dibistanê

  Mesrefên têkildarî gerran ji aliyê dibistanê va tên dabînkirin. Pêwîst e ku hûn diravê berîkê bidine zarokê xwe.

- Kelûpelên hewce jibo dibistanê

  Derbarê kelûpelên hewce li dibistanê(ji wan pênivîs, qelemtiraş, amûrên dîzaynkirinê, alîkariyeke pere bi qasî 100 Euro di roja 1ê Tebaxê û 50 Euro di roja 1ê Sibatê da tê radestkirin.

- Hatûçûn (Bilêta Şokolatê)

  Jibo zarokên ku jibo çûyîna bo dibistanê utubûs an trena bajarî bi kar tînin, mesrefa hatûçûnê tên qebûlkirin.

- Alîkariyên perwerdehiyê („perwerdehiyên mikemil“)

  Heke zarokek ji hêla perwerdehiyê va ji pola xwe paşda ketibe û anjî gengaziya navnivîsandina wî di pola jortir da kêm be, di rewşeke wiha da derfeta sûdwergirtina ji perwerdehiyê di derveyî saetên dibistanê da heye. Ev pêşniyarên bêpere yên dibistanê hertim di ewiliyet û yekemayetiyê da ne. Jibo amadebûna di van polên kemilîner û temamker da, we hewcetî bi belgeya piştrastkirinê ji aliyê dibistanê va heye.

- Alîkariya navrojê li dibistan, Baxçeyên Zarokan û çalakiyên derveyî dibistanê

  Mesrefa navrojê li dibistanê, tê pejirandin. Ev alîkarî rasterast radestî amadekerên navrojê tê kirin.

- Beşdariya çandî û civakî

  Jibo pêkanîna rewşekê ku zarok bikarin tev zarokên din herin nav klûpên Sporê û beşdarî çalakiyên derveyî pêvajoya dibistanê bibin, hûn dikarin di her mehê da alîkariyeke bio qasî herî pirr 15 Euro werbigirin. Li gorî qanûnê, ev alîkarî bo klûpa sporê tê raberkirin.

# Riya dibistanê



Bi destpêbûna sala perwerdehiyê, zarok zêdetir ji berê li nav kolanan in û carinan bi awayekî azad di riya dibistanê da diçin û tên.

- Beriya destpêbûna sala perwerdehiyê, hevrê digel zarokê xwe vê riyê herin û werin.
- Qanûn û rêzikên hatûçûn û derbasbûna ji kolanan hînî zarokê xwe bikin, wek mînak dema ku çiraya xaçeriyê kesk, zer an sor, anjî dema derbasbûna ji xêzên taybetî rêbihurkan ser xaçeriyê divê çawa bikin.
- Di hefteyên destpêkê yên dibistanê hetmen piştrast bin ku zarokê we babetên ewlehiyê berçav digire û heke pêwîst dike hevrêtiya wî heta dibistanê bikin, heta heke zarokê we bi peyatî an bi utubûsê diçe dibistanê.
- Elbete li dibistanê jî qanûnên ajovanî û derbasbûna ji kuçe û kolalan ji zarokan ra tên hînkirin da ku bikarin riya dibistanê derbas bikin.
- Di kêleka van fêrkariyan, ji pola yekem heta poal sêyem siwarbûna duçerxeyê jî tê hînkirin.
  - Ezmûna siwarbûna duçerxeyê di pola çarem da tê lidarxistin.





## Roja vekirina dibistanan

- Roja yekem a dibistanê pêşwaziya li zarokan tê kirin.
- Him jibo zarokê we û him jibo we bixwe, ev roj dê rojeke xweş be.
- Her dibistanekê rojeke taybetî xwe heye.





## Pakêtên dibistanê

- Rêûrisma xelatkirina van pakêtan bo zarokan di roja yekem a dibistanê da ji Sedsala 19an va li Almanyayê tê lidarxistin.
- Bi giştî di nava van pakêtan da, xurekên şêrîn anjî xelatên biçûk tên danîn.
- Ev pakêt him dikarin bên kirrîn û him jî dikarin bi hevakriya Baxçeyên Zarokan bên çêkirin.

## Kelûpelên dibisstanê 

Jibo destpêkirineke serketî, hewcetî bi alavên guncan heye.

- Di roja hevdîtina dêbavan da ku roja lidarxistina wê beriya betlaniyên Havînê ye, Lîsteyeke tam ji van kelûpelan raberî we tê kirin.
- Tenê kelûpelên navbirî di lîsteyê da bikirin. Ev hemî hewcetiyên zarokê we digire ber xwe.

Zarokê we hetmen hewcetî bi van babetan heye:

### Tûrikê Pişt 

- Jibo ku tûrikek baş jibo zarokê xwe bibijêrin, pêwîst e ku hûn bixwe hevrê digel zarokê xwe wê bikrrin û ji hêla rihetî û mezinahiyê wê biceribîne.
- Ji taybetmendiyên tûrepiştiyeke (tûrikê Pişt) em dikarin balê bikişînin ser siviktî, cinsê baş, mayîndetî û hevssengî li gorî mezinahiya zarok.
- Her wiha Tûrikên ku şevê dibiriqin (Tûrikên teyisok), îmkana naskirina zarok di şevê da dabîn dikin.
- Her wiha Tûrik divê têra xwe kapasîte û cihê wê hebe ku kelûpelên sporê têda bi cih bibin.

## Pişk û para navroj û vexwarinkê



- Taşte û vexwarinkeke baş û zengîn bandoreke girîng di mezinbûna zarok da dikin.
- Him navroj û him vexwarin divê bi rihetî bikarin bên vekirin.



## Pirtûkên dersê

- Zarokê we hewcetî bi pirtûkên dersê û kelûpelên din ên dibistanê heye.
- Beşek ji van pirtûkan ji aliyê dibistanê va û bi awayê emanet dikevin ber destê zarokan. Beşeka wan a biçûk divê ku hûn bixwe bikirrin.
- Kelûpelên weke peldank, lênivîsk, kaxez û qelem-rengiyan divê ji aliyê we bixwe va bên kirrîn.

# Jiyana rojane li dibistanê

## Fêrkar



- Beşeka zêde ya dersû waneyan ji aliyê fêrkar va tên raberkirin.
- Fêrkar yekem kes e ku zarokê we pêra dikeve têkilliyê û roleke girîng di mezinkirin û perwerdekirina zarok da heye.



## Bernamey û saetên dersê

- Her poleke dersê 45 deqîqe ne. Di rojên destpêka dibistanê da polên dersê bi giştî vekirî ne.
- „Bêhnvedana nav polan“ jibo bêhnevdana zarokan û nehatina zextê li ser wan e.

## Ispartek



- Zarokan jibo famkirna baştir a dersê û hînbûna wê, hewcetî bi temrînên berdewam û rêkûpêk hene.
- Dema têkildarî ispartekan nabe ku zêdetir ji 30 deqîqeyî jibo pola 1û 2 û zêdetir ji 45 deqîqeyan jibo pola 3û 4 be.
- Ev yek girîng e ku ispartek ji aliyê zarok bi xwe va û heta radeyan pêkan bi tenê bên cihanîn.

- Zarokê we hewcedarê we wek kesek pêbawerkirî ye. Dema ku hûn bi meyl û meraq babetên hînbûyî ji aliyê zarok va dişopînin û wî/ê han didin, dilê zarok germ dibe û meyl û meraqa wî/ê zêdetir dibe.

## Cihê xwendina dersê li malê

- Bi destpêbûna heyama dibistanê, zarokê we hewcetî bi cihê neguhêr û kesane jibo temrîn û dersa xwe heye.
- Ev derfet dibe sebeb ku hawîrdoreke guncan jibo pêkanîna ispartekan hebe, bêyî ku hiş û bala wî/ê tevlihev bibe.
- Mase û kursî divê li gorî mezinahiya zarok be.

## Rêziknameya notan



- Di heyama dibistanê da, xwendevan bi awayekî xwebixwe ji pola 1 derbasî nav pola 2 dibin.
- Rêziknameya ku zarok di dawiya salê da werdigire, not têda nehatine nivîsandin.
- Lê di dawiya sala 2 ya dibistanê da rêziknameya bi notan tê raberkirin.
- Nota herêî zêde 1 e (gellek baş) ku jibo baştirîn xxebatê tê dayînê û nota herî kêm 6 e (ne bes) ku bo xebata herî lawaz tê dayînê.

# Rola dêbavan



Di heyama dibistanê da jî weke heyama Baxçeya zarokan gellek rê jibo hene ku di dibistanê da beşdariyê bikin.

Di heyama dibistanê da civînên dêbav û fêrkaran bi awayê rêkûpêk tên lidarxistin û di van civînan da hûmn hin agahiyan derbarê babetên jêrê werdigirin:

- Babetên dersî û şêwazên fêrkariyê.
- Babetên hînkirî li gorî her dersekê cuda.
- Hûn dikarin derbarê her babeteke dersî û têkildarî dibistanê, ji fêrkarê zarokê xwe bipirsin û digel dêbavên din biaxivin.

Her wiha hûn dikarin heke bi qasî pêwîst dengan bi dest bixin, wek nûnerê dêbavên zarokan bixebitin. Bi vê riyê hûn dikarin xwestekên dêbavên zarokan bigehînin berpirsên dibistanê û fikrû nêrînên xwe di Komîteyên cûrbecûr ên Dibistanê hilêxînin.

Di destpêka sala nû ya perwerdehiyê da, kesek wek berdevkê Civata Sergêr û Fêrkaran û kesek wek piştgirê berjewendiyên wan, tê bijartin: Rêveberê Civata Pişteavniya ji xwendevanan.

# Navnîşan û riyên têkillî-girtinê

## Ezmûna Tsêketina bo Dibistanê

Rêveberiya Tendurustiyê ya Viersen'ê
Xizmetên Bijîşkiyê yên zarok û nûciwanan
Rathausmarkt 3
41747 Viersen
Faks 02162 39-1837

Rênîşandana Bijîşkî
Dipl. Med. Gabriele Meyer
Telefon. 02162 39-1947
E-Mail gabriele.meyer@kreis-viersen.de

- Heke we derbarê wergirtina demê ji dixtor pirsa xwe heye, dikarin seredana perestaran bikin.
- Heke perestar di demên ezmûnê da li ber dest nebûn, ji wan ra E-Mail'ê bişînin.
- Heke derbarê Navnivîsandina li Dibistanê û di heyama perwerdehiya zarokê xwe hewcetî bi Şêwirînê heye, hûn dikarin him bi riya telefonê û him bi riya E-Mail'ê digel wan bikevin têkilliyê.

## Kesên bersivdêr:

Nettetal, Niederkrüchten, Brüggen, Grefrath

- Brigita Tanzhaus, Perestar
  Tel. 02162 39-1515
  E-Mail brigita.tanzhaus@kreis-viersen.de
- Dipl.-Med. Gabriele Meyer, Dixtorê zarokan
  Telefon. 02162 39-1947
  E-Mail gabriele.meyer@kreis-viersen.de

Viersen, Dülken, Boisheim

- Insa Pröter, Perestarê zarokan

Telefon. 02162 39-1847
E-Mail insa.proeter@kreis-viersen.de

- Beate Thomas, Bijîşk
  Telefon. 02162 39-1510
  E-Mail beate.thomas@kreis-viersen.de

### Süchteln, Kempen

- Marita Hamelung, Perestar
  Telefon. 02162 39-1453
  E-Mail marita.hamelung@kreis-viersen.de

- Dr. med. Angela Hölsken, Dixtorê zarokan
  Telefon. 02162 39-1832
  E-Mail angela.hoelsken@kreis-viersen.de

### Tönisvorst, Schwalmtal

- Silke Schouren, Perestar
  Telefon. 02162 39-1944
  E-Mail silke.schouren@kreis-viersen.de

- Dr. med. Ina-Katrin Bützler, Dixtorê zarokan
  Telefon. 02162 39-1512
  E-Mail ina.buetzler@kreis-viersen.de

### Willich

- Heike Hansen, Perestar
  Telefon. 02162 39-1948
  E-Mail heike.hansen@kreis-viersen.de

- Dörte Kus, Dixtorê zarokan
  Telefon. 02162 39-1591
  E-Mail doerte.kus@kreis-viersen.de

# Pakêta Beşdarî-Perwerdehiyê ya

Navçeya Viersen'ê
Rêveberiya Rihetiya Civakî
Rathausmarkt 3
41747 Viersen

Kesên bersivdêr jibo pirsên gelemperî:

- Mathias Gey
  Telefon. 02162 39-1656
  Faks 02162 39-1726
  E-Mail but@kreis-viersen.de

Rêveberiya Peydakirina Kar a Vierseb'ê
Ofîsa Perwerdehî û Beşdariyê
Remigiusstr. 1
41747 Viersen

- Telefon. 02162 266-1111
  Faks 02162 2661-17111
  E-Mail jobcenter-kreis-viersen.7135-but@jobcenter-ge.de

# Rêveberiya Dibistan, xort û malbatê

## Civata Piştevaniya zarokan - Piştevaniya zarok û xortan

Kesên bersivdêr jibo pirsên gelemperî:

- Susanne Reinartz
  Telefon. 02162 39-1678
  Faks 02162 39-1685
  E-Mail susanne.reinartz@kreis-viersen.de

- Katja Schulte
  Telefon. 02162 39-1958
  Faks 02162 39-1685
  E-Mail katja.schulte@kreis-viersen.de

## Navenda Sazbûn digel Civakê (Entegrasiyon) a Şaredariya navçeya Vierssen'ê

### Perwerdehî di qonaxa seretayî da

- Felicia Bot-Jurca
  Telefon. 02162 39-1961
  E-Mail felicia.bot-jurca@kreis-viersen.de

### Perwerdehiya Dibistanê

- Georg Schiffer
  Telefon. 02162 39-1716
  E-Mail georg.schiffer@kreis-viersen.de

- Regine Selk
  Telefon. 02162 39-1775
  E-Mail regine.selk@kreis-viersen.de

- Michael Sönnert
  Telefon. 02162 39-1776
  E-Mail michael.soennert@kreis-viersen.de

- Petra Vohsen
  Telefon. 02162 39-1801
  E-Mail petra.vohsen@kreis-viersen.de

Sipasiyeke taybet ji hemî kesên ku di amadekirina vê belavokê da hevkarî kirin:

- Rêveberiya Dibistan, Xort û Malbatê – Karên Dibistanan
  Rêzdar Dr. Paul Thomas Mohr

- Rêveberiya Dibistan, Xort û Malbatê – Şêwirîna pisporî di perwerdekirina zarokan da
  Xanima Susanne Reinartz

- Rêveberiya Tendurusrtiyê ya Viersen'ê, Xizzmetên Bijîşkiya zarok û nûciwanan
  Xanima Dixtor. Gabriele Meyer

- Rêveberiya Rihetiya Civakî ya Viersen'ê, Pakêta Beşdarî-Perwerdehiyê
  Rêzdar Mathias Gey

KREIS VIERSEN

Kommunales Integrationszentrum Kreis Viersen

Kreis Viersen (Navçeya Viersen'ê)

**Sozialamt – Kommunales Integrationszentrum**

**(Rêveberiya Rihetiya Civakî – Navenda sazbûn digel Civakê)**

Rathausmarkt 3

41747 Viersen

www.kreis-viersen.de

Piştgira aborî:

Ministerium für Kinder, Jugend, Familie, Gleichstellung, Flucht und Integration des Landes Nordrhein-Westfalen

Ministerium für Schule und Bildung des Landes Nordrhein-Westfalen

Impressum

Weşan: Navçeya Viersen'ê – Rêveberiya Navçeyê
Sererastkirin: Felicia Bot-Jurca, Navenda sazbûn digel Civakê
Çapkirin: Hausdruckerei
Weşan: März 2020
Wêne: ©Kreis Viersen – KI und pixabay.com (Titelbild), flaticon.com (Icons)